azadkirin. Parêzerên Seleattîn Demirtaş îro şemiyê 14-09-2019an li Stenbolê derbarê azadkirina Demirtaş da daxuyaniyek belav kirin. Li ser navê parêzerên Demirtaş parêzer Benan Malû axivî û aşkere kir ku Molû Dadgeha Mafê Mirovan (DMM) biryara azadkirina Demirtaş dabû lêbelê dadgehê ew azad nekiriye. Malû aşkere jî kiriye girtina Demirtaş siyasî ye û divê Demirtaş bê azadkirin. Malûyê aşkere jî kiriye ku ji ber cezayê Demirtaş ji 5ê Gulana 2019an ve ketiye binê salekê, di çarçoveya kontrolê da divê Demirtaş bê berdand. Li gorî qanûnan divê Demirtaş demildest bê berdand û girtina Demirtaş di zindanê da ne qanûnî ye.

BasNews

Nêçîrvan Barzanî: PDK dikare pêşeroja gelê Kurdistanê baştir bike

Serokê Herêma Kurdistanê û Cîgirê Serokê PDKê Nêçîrvan Barzanî dibêje, derfeta serkeftinên mezin li pêşiya PDKê ne û PDK dikare pêşerojê baştir ji bo gelê Kurdistanê bidest ve bîne.

Îro 11.9.2019 bi amadebûna Nêçîrvan Barzanî û bi beşdariya hejmareke serkirde û berpirs û kadirên PDKê, konferansa bi navê (PDK di naba guhertinan de, nixandina rewşa niha û danîna danîna nexşeyekê ji bo pêşerojê) birêve çû.

Di wê konferansê de Nêçîrvan Barzanî gotinek pêşkêş kir û tê de ragihand: "Derfeta serkeftinên mezin li pêşiya PDKê ne û em dikarin pêşerojê baştir ji bo gelê Kurdistanê bidest ve bîne. Wek mînak jî tiştê ku me kir di salên derbasbûyî yên dijwar de, ku PDK tevî wan



hemû zehmetiyan û aloziyan û astengiyan karî di çarçoveya Hikûmeta Kurdistanê de roleke pêşeng bibîne di parastin û avakirina welat û birêvebirina Herêma Kurdistanê de, ku PDK bû parêzerê Kurdistanê û destkeftinên gelê Kurdistanê."

KDP.info

PAK: Şoreşa Îlonê hêvî û baweriya netewî careke din li herçar perçeyên Kurdistanê vejand



KDP.info- artiya Azadiya Kurdistanê (PAK) ku Bakurê Kurdistanê ye, bi boneya salvegera berpabûna Şoreşê Îlonê peyamek belav kir û tê de ragihand, Şoreşa Îlonê pêl û bahozeke xurt û mezin bû ku ev ewrên reş ji ser ezmanê her çar perçeyên Kurdistanê dûr xist û hêvî û hest û baweriya netewî, niştîmanî careke din li her çar perçeyên Kurdistanê vejand.

Peyama Buroya Çapemenî û Ragehandinê ya PAKê: "Îro 58emîn salvegera Şoreşa Îlonê ye. Di 11ê Îlona 1961ê de bi rêberatiya Mele

Mistafa Barzaniyê nemir Partiya Demokrat a Kurdistanê, gelê me yê Başûrê Kurdistanê li dijî Dewleta Iraqê serî hilda.

Piştî ku berxwedana Dêrsimê bi jenosîdeke mezin hate pelçiqandin û piştî ku Komara Kurdistan (Komara Mehabadê) hate rûxandin, demeke dirêj ewrên reş, bédengî û şikestineke mezin xwe berda ser ezmanê herçar perçeyên Kurdistanê.

Şoreşa Îlonê, pêl û bahozeke xurt û mezin bû ku ev ewrên reş ji ser ezmanê her çar perçeyên Kur-

distanê dûr xist; hêvî û hest û baweriya netewî, niştîmanî careke din li her çar perçeyên Kurdistanê vejand.

Şoreşa Îlonê şoreşa herçar perçeyên Kurdistanê bû. Şoreşa Îlonê li her çar perçeyên Kurdistanê, li her çar aliyê cihanê ji nû ve agirê vejîna Kurdaiyê pêxist.

Piştî Şoreşa Îlonê bi 9 salan, piştî serîhildana gelê me ya qehremanan, Dewleta Iraqê paşde gav avêt û naçar ma ku li gel Mele Mustafa Barzaniyê nemir rûne.

Roja 11.03.1970an Rêberatiya Şoreşa Başûrê Kurdistanê (Partiya Demokrat a Kurdistanê) û Dewleta Iraqê Peymana Otonomiyê îmza kirin, ku mafên gelê Kurdistanê yên îdarî, siyasî, aborî û çandî hatin naskirin û sîstema otonomiyê, ango sîstema xwe birêvebirinê hate damezrandin.

Em di 58emîn salvegera Şoreşa Îlonê de, bi hest û baweriya netewî, niştîmanî Şoreşa Îlonê weke şoreşa xwe dibînin û Mele Mustafa Barzaniyê nemir û hemû şehîd û kedkarên Şoreşa Îlonê bi giramî bibîr tînin."

KDP.info

Gorran du berpîrsên YNKê ji ber xerckirina 18 milyar dînarê budceya Silêmaniyê tometbar dike!

Parlamenterekî ser bi Tevgera Gorran aşkera kir, du berpîrsên YNKê 18 milyar dînar ji 20 milyar dînarê bo projeya paytexta rewşenbîrî re hatibû cuda kirin xerc kirine.

Li gor zanyariyên BasNewsê, sibe 15.09.2019ê li jîneyek li Parlamentoya Kurdistanê ve diçe bo Silêmaniyê, bo destpê kirina pêngavên lêkolînê li çawanîya xerckirina wî 20 milyar dînarê bo projeya paytexta rewşenbîriyê hatibû cuda kirin.

Vê derbarê de endamê fraksiyona Gorran li Parlamentoya Kurdistanê Daban Mihemed ji BasNewsê re ragehand, ji wî 20 milyar dînarê projeya paytexta rewşenbîrî, 28 milyar bi îmzaya wezîrê berê yê rewşenbîrî û ciwanan û parêzgerê berê yê Silêmaniyê re hatiye xerc kirin.

Wezîrê rewşenbîrî û ciwanan Xalîd Doskî û parêzgerê berê yê



Silêmaniyê Aso Fereydûn her du pişkên YNKê yên li ser wan erka bûn. Parlamenterekî Gorran got, tenê 2 milyar dînar ji wî 20 milyar dînarê projeya paytexta rewşenbîrî, bi îmzaya rêveberiya giştî yê rewşenbîriya Silêmaniyê re hatiye xerc kirin û "Eger ev pîrs neyê zelal kirin, emê pîrsîrêkê bibin pêş dadgehê."

Piştî ku bajarê Silêmaniyê ji aliyê Parlamentoya Kurdistanê ve wek paytexta rewşenbîriyê ya herêma Kurdistanê hat pênas kirin, 20 milyar dînar ji aliyê hikûmeta herêma Kurdistanê ve bo warê rewşenbîriyê li paytexta rewşenbîriyê re hate cuda kirin ku vê dawiyê lîsteya xercan hate belav kirin.

BasNews

Wezîrê Derve yê Rûsyayê serdana Kurdistanê dike



Wezîrê Derve yê Rûsyayê, Sergey Lavrov di destpêka mehê bihê de serdana Iraqê û Herêma Kurdistanê dike.

Cîgirê Wezîrê Derve yê Rûsyayê, Mîxaîl Bogdanof ragihand, di destpêka Cotmeha Îsal de Sergey Lavrov dê serdana Bexdayê û piştê jî serdana Hewlêra paytexta Herêma Kurdistanê bike.

Bogdanov herwiha diyar kir, di serdana xwe ya bo Hewlêrê de, Lavrov dê li gel Serokê Herêma Kurdistanê, Nêçîrvan Barzanî û Serokwezîrê Herêma Kurdistanê, Mesrûr Barzanî civîn û hedvîtinan pêk bîne.

Ev dibe yekemîn serdana Sergey Lavrov bo Herêma Kurdistanê, di heman demê de dibe

yekemîn serdana berpirsekî pilebilindê Rûsya bo Herêma Kurdistanê.

Di dema destbikarbûna Nêçîrvan Barzanî weke Serokê Herêma Kurdistanê de, Wezîrê Derve yê Rûsyayê, Sergey Lavrov bi rêya balyozê wî welatî yê li Bexdayê, Maksîm Maksimov pîrozbahî li wî kiribû.

Pêştir Lavrov, li Rûsyayê û di çend civînen navdewletî de, çend caran bi rayedarên Herêma Kurdistanê re civiyaye. Herêma Kurdistanê û Rûsya di wan çend salên dawiyê de pêwendiyên xwe berfirehtir kirine û bi taybet di warê enerjîyê de peywendiyên navbera Hewlêr-Moskowê gelek ber bi pêş ve çûne. Sala 2016an, Nêçîrvan Barzanî û Sergey Lavrov di dema birêveçûna Korbenda Aborî ya Cîhanî de li Saint Petersburg a Rûsyayê bi hev re civiyabûn û tekezî li ser pêşxistina pêwendiyên dualî û bi taybet peywendiyên navbera kompaniyayên warê enerjîyê kiribûn.

rojvakurd.com

Dadgeha li ber destê Barzanî

Dadgeha Li Ber Destê Barzanî: Ekrm Beg Cemîl Paşa (1895 – 1975): têkoşerê kurd, yê ku tev jiyana xwe di ber welat û welatîyên xwe de xerc kir.. Dibêjin; di sala 1967an de, dema ku rêjîma Sûriyê dest danî ser tev gundên zarok û



neviyên Cemîl Paşa li Cizîra Sûriyê/ Derbasîyê û bi tenê Mihemed Begê Cemîl Paşa bi par hiştin.. Hingî Ekrem Beg doza para xwe li pismamê xwe Mihemed Beg kir.. Lê pismamê wî lê da mandelê û got ez nadim, here li min gilî bike.. Ekrem Beg lê vegeand: Pismam! Ez ê li kû li te gilî bikim..?!!! Bi qesem, ez di dadgehên ereb, tirk û fîrsê de li te gilî nakim, bi tenê ku desthilatîyek kurdî çêbibe, ez ê li wê desthilatê li te gilî bikim.. Û sal derbas bûn.. Di sala 1970î de, piştî ku peyman 11ê adarê hat mor kirin, Ekrem Beg çû serdana Barzanîyê nemir û giliyê pismamê xwe Mihemed Beg li cem kir..

Konê Reş, avestakurd.net

Nobeda Wanê di roja 27'an de ye: Em ê şaredariyên xwe bistînin

Di Nobeda Demokrasiyê ya li Wanê de peyama 'Em ê şaredariyê xwe bistînin. Em radestî polîtîkayên şer ên AKP-MHP'ê

bûn.

'EM Ê TÊBIKOŞIN Û ŞAREDA RIYAN BISTÎNIN'

Parlemetera HDP'ê ya Rihayê

vî gelî tiştê nekirin. Em ê dubare şaredariyên vîna gel in bistînin."

Surucu bal kişand, hevşaredara HDP'ê Yadîşen Karabûlak jî di nav de 21 HDP'î hatin destgîrkirin û got: "Em ev operasyon gelek dîtine. Gelê me gav bi şûnde navêjin. Em ê her demê li têkoşîna xwe xwedî derbikevin. Girtina şermezar dikin. Ji bo aşîya gelan em qet dev ji têkoşîna xwe berandin."

'BI TEQEZ WÊ AŞTIYEKE BIRÛMET BI SER BIKEVE'

Hevseroka Giştî, ya Partiya Sosyalîst a Hejaran (ESP) Ozlem Gumuştas diyar kir biloka AKP/MHP'ê di nava neçareseriyê de ne û got: "Dîsa qesri li dijî vîna me dixwaze derbikeve. Bi girtinan, lêpîrsîn û rûniştinan dixwazin destkeftiyên me terorîze bike. Em li vir li ber xwe didin. Em bi hîlbijêr, vîn, nûnerên xwe re ne. Em li dijî polîtîkaya serwer a mêr a AKP'ê li ber xwe bidin. Em xwe radestî polîtîkayên şer ên AKP/MHP'ê nakin. Em ê bi teqez bi ser bikevin. Wê li Tirkiyeyê bi teqez çareseriyê demokratîk û aştiyek birûmet bi ser bikeve."

anfkurdi.com



nabin' hate dayîn.

Berxwedana Nobeda Demokrasiyê ya li dijî qeyûman a li Wanê di roja 27'an de ye. Çalakî li pêşîya avahiya HDP'ê ya Îpekyolûyê pêk hat pankartên 'Ne vîna qeyûm, vîna gel' vekirin û li gel parlemeterên HDP'ê, Hevseroka Giştî ya Partiya Sosyalîst a Hejaran (ESP) Ozlem Gumuştas, hevşaredar û gelek kes amade

Ayşe Surucu ya di nobedê de axivî diyar kir ku qeyûm ji derveyî desteserkirina vîna gel ne tiştêkî dine û got: "Berî niha jî 94 şaredarî dagirkiribûn. Hevşaredarên me hatibûn girtin. Em ê carekî din şaredariyên xwe bi vîna gel stand. Lê dîsa 3 şaredariyên me bi darê zorê dagirkirin. Em polîtîkayên qeyûman baş dizanin. Şaredariyan dixin bin deyan û talan dikin. Ji bo

Li Mêrdînê banga berxwedan û yekîtiyê hate kirin

Li Mêrdînê çalakiya li dijî desteserkirina şaredariyan di roja 26'an de ye. Di çalakiyê de banga berxwedan û yekîtiyê hate kirin.



Nobeda demokrasiyê ku li Mêrdînê li dijî qeyûm tê kirin di roja 26'an de ye. Çalakî di nava dorpêçiya polîsan de li ber avahiya HDP'ê ya bajêr pêk tê. Piştî kombûna girseya gel daxuyaniyek ji çapemeniyê re hate ragihandin.

Bi navê Meclîsên Ciwanên HDP'ê yê Mêrdînê Nadîre Çelîk axivî û diyar kir ku wê li dijî feraseta qeyûm rawestin.

Rêveberê Komeleya Nivîskarên Mêrdînê nivîskar Ahmet Çelîk jî bang li Serokê Giştî yê CHP'ê Kemal Kılıçdaroglu kir ku li dijî desteserkirina îrade û mafê gel helwestê nîşan bide.

Parlamentê HDP'ê yê Amedê İmam Taşçier jî got, "Eger Kurd yekbûna ne pêvajoya Kobanê rû dida, ne qeyûm dihate tayînkirin, ne jî îradeya gelê Kurd dihate desteserkirin. Dem dema yekîtiyê ye. Em bibin yek. Yek ji aktorên mezin ên li Tirkiyeyê Kurd in. Eger em di vî pêvajoyê de bibin yek hingî wê nikarin bi ser me ve bîn. Ji ber vî yekê em ê hewldanên xwe yê ji bo yekîtiya gelê Kurd bidomînin."

anfkurdi.com

Fatih Yıldız: "Xeta petrolê ya Kerkûk-Ceyhanê bo Tirkiyê stratejîk e"

Balyozê Tirkiyê yê Iraqê Fatih Yıldız li Bexdayê piştî tevî "Form a Enerjîyê ya Iraqê" bû, ragihand ku xeta petrolê, di stratejiya Tirkiyê de berya gelek tiştan tê. Yıldız got; bo Xeta Kerkûk-Ceyhanê dê di heman guzergahê de îlawe xet bîn çêkirin û bê qewî kirin. Xebata xetê di stratejiya Iraq û Tirkiyê de herî li pêş e. Yıldız weha got:

"Piştî rêxistina terorê DEAŞ hat def'kirin, xeta petrolê ya Kerkûk-Ceyhanê car din di rojê me de ye. Di vî çarçoveyê de di guzergâha xetê de, dê xeta petrolê bi îlawe xetêkî bê piştekkirin û katinan wê ya faalîyetê bo me stratejiya ewiliyê."

Balyozê Tirkiyê yê Bexdayê Fatih Yıldız ragihand ku têkiliyên wan bi Iraqê re, ne tenha bi petrolê



ye û axaftina xwe weha da dewamkirin: "Têkiliyeka me ya dinê bi Iraqê re elektrîk e. Astengiya di peşîya me de yek jê ew e ku li aliyê Iraqê xetên elek-

trîkê kêmin. Eger van kêmasiyan temam bibin, di dema peşîya me de, di serî de Mûsil û deverên ku nêzî Tirkiyê ne, em ê elektrîkê bidin wan."

PeyamaKurd

Pompeo ji 100 êrîşên doh Iran sûcdar kir

Wezîrê Derve yê Amerîkayê Mike Pompeo ji ber êrîşên doh ên bi ser kargehên petrolê yê Erebîstana Siûdî, Îran sûcdar kir û got, ew dê ligel hevpeyman û şirkên xwe li ser kar bikin ku berpirsê wan êrîşan Îran e. Pompeo li ser hesabê xwe yê Twitterê diyar kir ku Serokomarê Îranê Hesên Rûhanî û Wezîrê Derve Cewad Zerfî li aliyekî xwe wekî ku dîplomasiyê dikin nîşan didin, lê li pişt zêdetirî 100 êrîşên doh hatin kirin jî ew hene. Hûsiyên Yemenê ku girêdayî Îranê ne doh bêhtirî 100 êrîş bi ser kargehên petrolê yê Siûdî de pêk anîbûn û Serokê Amerîkayê Donald Trump jî pêwendiyê telefonî ligel Welîehd Prensê Siûdî Muhammed bin Selman pêk anîbû û êrîş şermezar kiribûn.

Berdevkê Ewlekariya Wezareta Karên Hundir a Erebîstana Siûdî ragihandibû ku roja şemiyê 14-09-2019an di saet 04.00an de agir bi 2 kargehên şirketa Aramco yê li parêzgeha Beqîq û Hecret Xerîs ketiye û sedem jî êrîşa bi firokeyên drone ye.

PeyamaKurd



58 sal berê şoreşa Eylûlê bi serokatiya Barzaniyê nemir destpê kir

Konê Reş: Di rojek Dinya girt û berneda mîna îro de berî 58 salan Zingezinga zengilê min şoreşa Eylûlê bi serokatiya Xweş hawar û gazî ye Barzaniyê nemir destpê kir.. Ez vê helbesta Sebrî Botanî ji vê rojê re dikim diyarî:
Zingezinga zengilê min
Vaye dîsa deng veda
Dengê doza mîletê min
Dinya girt û berneda
Zingezinga zengilê min
Xweş hawar û gazî ye
Awaza vî zengilê min
Ji ferhenga Qazî ye
Her weku birq û birûskê
Xwe gîhand çerxa felek
Sed xweşî bo vî dilê min
Ku min dî kurd bûne yek..

PDK li Kerkûkê dixwaze yek listeya Kurda hebe



Berpîrsê Liqa 3 yê Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK), Mehemed Xurşîd ragehand: PDK li gel yek listeya hevbeş a aliyên Kurdistanî ye bo hilbijartina encûmena parêzgeha Kerkûkê.

Îro duşemê Mehemed Xurşîd ji Kurdistan24ê ra axivî û got: Wek PDK em yekem partî bûyîn me daxwaza yek listiyê kir bo helbijartina Civata parêzgeha Kerkûkê." Herweha Mehemed Xurşîd got: Em li gel wê yekê ne ku kurd yek deng û yek helwêst bin. Bi rêya telephone ve em li gel aliyên Kurdî li Kerkûkê axivîne û me helwêsta xwe bi wan re ragehandîye, ku em li gel yek listeyê ne û me pêşniyaz jî kir ku girînge nave listê navê Kurdistanê têde hebe, lê xoşbextane navê listê hatiye ragehandin û nave listê (Kerkûk Kurdistanî ye) ye.

Îro aliyên siyasî yên Kurdistanî li Kerkûkê bi mebesta pişikdarîkirinê di helbijartinên encûmena parêzgehê civiyên û rêkevtin ku bi lista hevpişik pişikdarîyê di helbijartinê de bikin.

Biryare 1ê Nîsan a dahatî piroseya helbijartina encûmena parêzgehê Iraqê birêve biçe. **anfkurdi.com**

Nasnameya akademîsyena li Îranê zîndankirî aşkera bû

Akademîsyena ku hemwelatiya Awûstralya û Brîtanyayê ye û ji aliyê dewleta Îranê de 10 sal ceza lê hatiye birîn, li zanko ya Melbourne dixebite û navê wê Kylie Moore-Gilbert e. Kylie Moore-Gilbert xebatên xwe li ser Rojhilata Navîn dike. Gilbert salekiye bi sedemeka ku nayê zanîn di zîndana Îranê de ye û dadgeh 10 sal ceza lê biriye.

Li gor ragihandina Zanko ya Melbourne; malbata Moore Gilbert bi hukumeta Awûstralya re di nav têkiliyan de ye lê bi sedema xesasiyeta mijarê nikarin agahiyên zêde bidin. Malbata akademîsyena girtî bo xebata zanko û hukumetê sipasiya xwe kir û weha got:

"Em bawerin bo dagera Kylie rêya herî baş diplomasiye. Em ê zêde şirove nekin. Em niha dixwazin bo mahremiyeta hevalên me û malbata me rêz bê girtin."

Medya Brîtanyayê ragihandibû ku du jinên xwedî nasnameyên Awûstralya-Brîtanyayê û zilamekî Awûstralyayî di demên cuda de li Îranê hatine girtin û xistine zîndana li Tehranê ya bi navê Evîn. Navên Mark Firkin û jin a wî Jolie King hatibû aşkerakirin lê navê akademîsyen nehatibû gotin. **PeyamaKurd**

Encûmena Wezîran çend biryarên girîng derxist


Îro Encûmena Wezîran a Herêma Kurdistanê bi serokatiya Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî civiya û çend biryarên girîng derxist.

Civîna Serokê Encûmena Wezîran derencama civîna hevbeş a Hikûmeta Herêma Kurdistanê û firaksiyonên Kurdistanî li Parlemana Iraqê û endamên Komîta Darayî li firaksiyonên Kurdistanî ku roja 8ê Îlonê li Hewlêrê hatibû girêdan gotûbêj kir.

Di civîna îro de biryar hat dayîn, hefteya bê şandeke Hikûmeta Herêma Kurdistanê serdana Bexdayê bike, bi mebesta guftûgo pevguhartinê zanyariyan derbarê pîrsa budce û beşdariya Herêma Kurdistanê di qonaxa sereta ya amadekirina reşnivîsa budceya 2020 ji aliyê Wezarta Darayî ve.

Biryar hat dayîn jî, komîteyên (darayî, petrol û gaz, yasayî) li Parlemanta Iraqê bo Herêma Kurdistanê bêne vexwandin.

Roja 12.9.2019an şandeke Hikûmeta Herêma ligel Parlemana Kurdistanê dê bicive, bo pêşkêşkirina



na data û zanayariyên pêwîst derbarê guftûgoya di navbera Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Federal de.

Di birgeya duyem a civînê de, Wezîrê Plandanê raportek derbarê projeya serjimarîyariya li Iraqê pêşkêş kir, ku biryar e sala 2020an bê encamdan. Wezîrê Plandanê ronî xiste ser aliyên ev projeyê û amadekariyên Herêma Kurdistanê. Di vê derbarê de biryar hat dayîn komîteke taybet pêk bê ji bo nirxan-

dinaprojeya serjimeryariyê bi berçavkirina berjewendiyên Kurdistanîyan bi hemû pêkhatiyên netewî û olî.

Di dawiyê de, civînê guftûgo derbarê mîkanîzma nû bo rêkxistina bacê kir, bi awayekî di berjewendiyên giştî de be.

Di wê derbarê de Encûmena Wezîran projeya peyrewê ya taybet bi lînûsên bazarê pesend kir, ku mîkanîzma nû bo rêkxistina bacê lixwe bigire. **KDP.info**

Divê şer û çalakî dawî bîne

Şer û êrîşên Dewleta Tirkîyeyê û çalakîyên çekdarî yê PKKyê divê bi dawî bîne Li Pasûr (QULP) a Navçeya Amedê, di roja 12.09.2019an de di encama teqînê de, 7 kes hatin kuştin, 10 kes jî birîndar bûn. Em vê êrîşê şermezar dikin. Me her cûreyeke êrîş û çalakîyên terorî yê ku zerarê dide sivîlan, bêyî teredut şermezar kir, îro jî em her şermezar dikin.

Dewleta Tirkîyeyê ji bo destkeftiyên gelê me jî holê rake, ji bo rê li ber xebat û çareserîya siyasî, sivil, demokratîk bigire, li Bakur û Rojava û Başûrê welatê me şer û êrîşên xwe didomîne. PKK jî bi şerê xendek û barîkatan, bi çalakîyên xwe yê çekdarî ku zirarê dide gelê me, rê ji êrîşên Dewleta Tirkîyeyê xweştir kir, xweştir dike.

Heta ku ev şer û êrîşên Dewleta Tirkîyeyê berdewam bin; heta ku PKK êrîş û çalakîyên xwe yê çekdarî yê ku zerarê digihîne gelê me, digihîne doza me berdewam bike, dê kuştin û wêranî her li ber deriyê me bin. Mafê tu kesî tune ye ku



meşrûbûn û însanîbûna çalakîyên Dayikên Şemiyê jî, dayikên li ber deriyê avahîya HDPyê li zarokên xwe digerin jî bixin ber gengeşîyan, tune bihesibînin; ev bê wîcdanî ye. Ev daxwaz û hestên dayikan, encama vî şerî ne, encama siyaseta binpê kirina maf û azadiyên mirovan e. Û nabe ku tu kes ji bo armancên xwe yê qirêj van hestên dayikan îstîsmar bikin.

Heta ku ev şer û êrîşên Dewleta Tirkîyeyê berdewam bin; heta ku PKK bi êrîş û çalakîyên xwe yê çekdarî yê ku zerarê digihîne gelê me, digihîne doza me berdewam bike, bi hezaran gelê me yê sivil

rojekê li Pasûrê(QULP), rojekê li Qoserê, rojekê li Amedê yan jî li cîhekî din dê bibin qurbanîyên vî şerî û van çalakîyên çekdarî. Ji bo rê ji çareserîyêke sîyasî û sivil re vebe, ji bo dawî li van kuştinan bê, divê Dewleta Tirkîyeyê demildest vî şerî û van êrîşan bidawî bîne. PKK jî, divê bi şer û li çalakîyên xwe yê çekdarî ji Dewleta Tirkîyeyê re rê xweştir neke û bêyî ku li hevîya siyaseta Dewleta Tirkîyeyê bimîne, divê demildest dawî li şerî û li çalakîyên xwe yê çekdarî bîne.

Nabe ku qebûl kirina maf û azadiyên gelê me yê netewî, demokratîk, ji ber vî şerî bêne paşguh kirin, bêne tecîl kirin, bêne red kirin. Divê em bi awayekî girseyî û bi biryardarî ji helwesteke bi vî rengî re bêjin 'na'. Divê ji bo çareserîyêke sîyasî, sivil, demokratîk ya rasteqîn gav bêne avêtin. Divê li ser bingeha maf û azadiyên gelê Kurd û Kurdistanê, hemû partiyên Kurdistanî, hemû aliyên berfireh yê Kurd û Kurdistanî mixatabê çareserîya sîyasî bin. **anfkurdi.com**


Lindsey Graham: Dema wê yekê hatiye Amerîka êrîşî Îranê bike

Senaorê Amerîkayê Lindsey Graham ragihand divê Amerîka êdî êrîşî kêlgehên neftê yê Îranê bike armanc.

Ji ser rupela xwe ya medyaya civakî ji ser twitterê Lindsey Graham derbarê êrîşên li ser kompaniyaya "Aramco" li Siûdiyê ya ji aliyê Hûsiyan va peyamek belav kir. Lindsey Graham got: "Dema wê yekê hatiye Amerîka êrîşên ser kêlgehên Îranê bixe ser masê."

Herwiha Lindsey Graham amaje bi wê yekê jî kiriye ku dema wê yekê jî hatiye Amerîka piştî Îranê bişkîne. Lewre Komara Îslamî ya Îranê li dû ajawegeriyê ye û armancê û êrîşa li ser kêlgehên herî dawî jî bi wê armancê bûn.

Duhê Berdevkê Ewlekariya Wezaretê Karê Nevxwe yê Erebiştana Siûdî ragihand ku îro şagîr bi 2



kargehên şîrketa Aramco yê li parêzgeha Beqîq û Heçret Xerîs ket. Şewatê ji ber armancgirtina firokeyên drone rû da.

Di heman demê de berdevkê Hûsiyan ji kanala El-Mesîra re eşkere kir ku komên Hûsiyan bi vê

bûyerê rabûne û 2 kargehên şîrketa Aramco ya li Erebiştana Siûdî yê li herêmê rojhilat kirin armanc.

Berdevê Hûsiyan got bi dehan firokeyan raffineriyên li Beqîq û Xerîs ên li rojhilatê Erebiştana Siûdîyê kirin armanc. **BasNews**

PDK-S: Şoreşa Îlonê bingeh bo avakirina dibistana xebat û têkoşînê danî



Partiya Demokrat a Kurdistanê – Sûriyê (PDK-S) bi boneya salvegera destpêkirina Şoreşa Îlonê peyamek

belav kir û tê de hatiye: "Şoreşa Îlonê ya pîroz ya bi rêbertiya Mele Mistefa Barzanî yê Nemir veguhasineke girîng û pêşketî di dîroka şoreş û serhildanên Kurdistan di dirêjahiya dîrokê de çê kir û bingeh bo avakirina dibistana xebat û têkoşînê danî, bo bidestana hêvî û daxwazên gelê Kurdistanê."

Polîtburoya PDK-Sê peyama xwe ya pîrozbahiyê arasteyî Serok Mesûd Barzanî, Partiya Demokrat a Kurdistanê, Pêşmergeyên Qehreman û gelê Kurdistanê kir û hêviya berdwamiya pêşketin û serkeftinan li ser rêbaza Kurdaniyê rêbaza Barzaniyê Nemir kir.

Di peyama Polîtburoya PDK-Sê de hatiye ku, Şoreşa Îlonê ya pîroz

ya bi rêbertiya Mela Mistefa Barzanî yê Nemir veguhasineke girîng û pêşketî di dîroka şoreş û serhildanên Kurdistan di dirêjahiya dîrokê de çê kir û bingeh bo avakirina dibistana xebat û têkoşînê danî, bo bidestana hêvî û daxwazên gelê Kurdistanê.

Di beşeke din a daxuyaniya PDK-Sê de hat, bi xwîna şehîdan, têkoşîna Pêşmergeyên qehreman û serkirdatiya hişmend şoreşê karî gelek destkeft û armancan bidest ve bîne û di pêşiya wan de rêjîma Iraqê ya rûxandî neçar kir ku peyman 11ê Adara 1970 îmze bike û li mafên gelê Kurdistanê ya otonomiyê (sîstema xwebirêvebirinê) mîkur bê.

PDK-Sê di daxuyaniya xwe de amaje bi wê dike, tevî şikestina 6ê Adara 1975an, lê kizotê têkoşînê venemirî, lêbelê zêdetir geş bû û ji nû ve di 26ê Gulana 1976an de destpê kir. Herwiha di peyama PDK-Sê de hat, îro zêdetir rêbaza şoreşê (rêbaza Barzaniyê Nemir) xurtir dibe û pê re projeya netewî ya Kurdistanî bi serokatiya Serok Mesûd Barzanî bipêş dikeve û bi saya wê jî federalîzm ji Herêma Kurdistanê re bicih hat û gelê Kurdistanê bi hêviya destkeftine din e bi taybet piştî referandûma dîrokî di 25ê Îlona 2017an de ya ku kevîrê bingehîn a serxwebûna Kurdistanî danî.

KDP.info

Li Tirkîyê îstîfayên ji AKP ê devam dikin

Piştî serokwezîrê berê Ahmet Davutoğlu û hevalên wî ji AKP ê îstîfa kirin, li peywan gelek dest bi îstîfayan kirin. Îro jî parlementerê berê yê bajarê Konyayê Ömer Ünal û par-



lementerê berê yê Agiriyê Cesim Gökçe ji AKP ê îstîfa kirin.

Piştî Ahmet Davutoğlu, cîgirê serokê AKP ê yê berê Selçuk Özdağ, parlementerê berê û serokê komîsyona mafên mirovan ya Meclîsa Tirkîyê Ayhan Sefer Üstün, parlementerê berê yê Îstenbolê Abdullah Başçı, serokê leqa Îstenbolê yê berê Selim Temurci û serokê berê yê leqa Ankara Nedim Yamalı jî ji partiye îstîfa kirin. Parlementerê berê Feramüz Üstün, damezrênerê leqa Şişliyê Ahmet Müfit Cengiz di ser hesabê xwe yê medyayê de ragihandin ku ji partiye îstîfa kirine. Piştî van îstîfayan tê gotin ku Ahmet Davutoğlu xebata avakirina partiye lezandiye û wê di 2 mehan de partiye ava bike.

PeyamaKurd

Dihok - Heft belgefilm dê bihêne nimayîşkirin

Berdevkê Heftemîn Festîvala Fîlman a Dihokê ya Navdewletî Hilket Îdrîs da zanîn ku wê îro 15 film bihêne nimayîşkirin û ji wan jî heft jê belgefilm in



Hilket Îdrîs îro yekşemê 15-09-2019an ji Bas-Newsê ra axivî da zanîn ku wê îro 11:00an panelek bi navê "Rola muzîkê di sinema kurdî da" bihête gengeşkirin.

Herwiha Hilket Îdrîs aşkere jî kir ku wê filmên îro li holên sinema maks li Dihok molê bihêne nimayîşkirin. Îdrîs da zanîn ku îro nimayîşkirina filman li hola Zankoya Dihokê tune ye.

BasNews

Bexda ji wan deynên navnetewî 9 milyar dolaran deyndarê herêma Kurdistanê ye!

Endamê fraksiyona PDKê li Parlamentoya Iraqê ragehand, hikûmeta Iraqê ya federal bi giştî ew



deynên navnetewî yê salên borî de kirine, ji wan deynan 9 milyar dolaran deyndarê herêma Kurdistanê ye. Endamê fraksiyona PDKê li Parlamentoya Iraqê Beşar Kikî ragehand, hemû mûsteheqên darayî yê herêma Kurdistanê ji aliyê hikûmeta Iraqê ve di navbera salên 2014ê heta 2018ê ku nehatine dayîn nêzîkî 80 milyar dolar e.

Herwaha ji rojnameya Şerqulwaset re ragehand, Bexda nêzîkî 9 milyar dolarên herêma Kurdistanê jî deyndare ji ber pareyê ku ji qada navnetewî deyn kiriye û mafê Kurdistanê nedaye.

Kikî amaje bi wê yekê jî kir, ku hikûmeta herêma Kurdistanê cîdî ye bo geheştina rêkeftinekî temam a her du aliyan, di vê çarçoveyê de hin guhertin di şirketên Somo û şirketên Nefta Bakur de ji aliyê derxistina biryar û vekirina hesabek bod ahata 250 hezar bermîl li gor yasaya budce tê kirin.

BasNews

Huda Par: Heta pîrsa kurd çareser nebe Tirkîye sernakeve

Cîgirê Serokê HUDA-PAR Zekeriya Yapicioglu beşdarî bernamaya "Rojev" a Kurdistan24ê bû û li ser naveroka civîna wî bi Serok Barzanî re ragihand, armanca me ji vê serdana bo Herêma Kurdistanê vekirina nûnertiya HUDA-PARê bû û spasiya Serok Barzanî û hikûmeta Herêma Kurdistanê dikin ku ji bo vekirina nûnertiye hevkar bûn.

Herwiha got: Di civînê de çareserkirina pîrsgirêkên navçê, pêwendiyên Herêma Kurdistanê û Tirkîyê, pêwendiyên partî û saziyên Bakur û Başûrê Kurdistanê.

Yapicioglu amaje bi wê jî kir, "Bi vekirina nûnertiya HUDA-PARê li Herêma Kurdistanê, me xwast peyamekê bidin, ku pêwendiyên me bi Serok, hikûmet, partî û gelê Herêma Kurdistanê re xurt bin û em girîngiyê jî didin van pêwendiyên."


Li ser beşdarnebûna HUDA-PARê di hilbijartinên herêmî yê Tirkîyê de, Yapicioglu got, sedemek ew bû ku qeyranaborî ya Tirkîye tê re derbas dibe, bandor li me jî kir. Li Tirkîyê partiya benda (% 3) derbas neke, nikare alîkariyê ji hikûmetê bistîne. Sedema duyem jî, li wîlayetên ku rêxistinên me hîna lê nîn in, me xwast em xwe li wir birêxistin bikin û xwe ji bo hilbijartinên 2023an amade bikin.

Aşkere kir jî, di hilbijartinên 31ê Adarê de ji bo dengên HUDA-PARê gelek partiyên pêwendî kirin, lê bi piranî dengên me ji Ak Partî re çûn.

Derbarê tifaqên li Tirkîye û Bakurê Kurdistanê di navbera aliyên de çê bûne de Yapicioglu da zanîn, HUDA-PAR cihê xwe di ti tifaqê de negirt. Diyar kir jî, ji bo hilbijartinên 24ê Hezîrana 2018an 5 partiyên Kurdistanê hevdiîn bi me re kir û ji me xwast ku tifaqekê ku HDP jî di nav de çê bikin. Lê ji ber ku em helwesta HDP jî berê de dizanin, em yek neçû serî.

Li ser tometên HDPê yê derbarê HUDA-PARê de, Yapicioglu got: Ev

propagandiyên qirêj û reş in. Di 6 û 8ê Cotmehê êrîşî baregehên me kirin û 25 cihên me şewitandin û hejmarek ji biraderên me di nav û li ner baregeha me de şehîd kirin. tevî wê jî ew me wek êrîşker nîşan bidin û xwe jî



qurbanî dibînin."

Herwiha got: "Em partiyeke siyasî ne û ti hêza me ya çekdar jî tune ye. Lê ji ber ku ew (HDP/PKK) nexwazin ji bilî wan ti hêzek yan ti siyasetek li Kurdistanê Tirkîyê bê meşandin, kî derkeve, ew dibêjin yan tekevin bin baskên me, yan jî hûn alîkarê dewletê ne."

Derbarê HUDA-PARê de Yapicioglu got: "Damezrênerên HUDA-PARê ji sedî 95 Kurd in, lê em partiyeke Îslamî ne, lê di bernamaya partiya me de çareserkirina pîrsgirêka Kurd pîrsa herî sereke ye. Lê kesên xwe wek siyaseta Kurd binav dikin, hatine astekê ku dibêjin pîrsgirêka Kurd nemaye û behsa demokratbûna Tirkîyê dikin."

Cîgirê Serokê HUDA-PARê li ser pîrsa Kurd li Tirkîyê got: Li Tirkîyê nêzîkî 20 salan e partiya desthilatdar xwe Îslamî dibîne û HUDA-PAR jî deng di hilbijartinan de daye wê, lê ji çareserkirina pîrsa Kurdî dûr ketiye,

Yapicioglu got: "Ak -Partî xwe partiyeke (muhezfezkar-demokrat) e, heger serkirdatiya wê wek Îslamî tê diyarkirin, lê bernamaya wê partiye cuda ye. Rast e Ak Partî ji çareserkirina pîrsa Kurdî dûr ketiye û dibêje

anfkurdi.com

Îro Parlamentoya Kurdistanê li Bexdayê doz vedike!

Biryare îro 15.09.2019ê Parlamentoya Kurdistanê li dadgeha federal a Iraqê doz li ser yasaya helbijartinên encûmena parêzgehan veke û parêzerên hatine erkdar kirin jî li Bexdayê ne.



Serokê lijneya navçeyên Kurdistanê yên derveyî îdareya herêma Kurdistanê li Parlamentoya Kurdistanê Ciwan Yûnis ji BasNewsê re ragehand: "Îro Serdar Herkî ku parêzere diçe Bexdayê û li dadgeha federal doz li hember yasaya helbijartinên encûmena parêzgehan dê veke."

Herwaha got: "Yasaya helbijartinên encûmena parêzgehan dijî pêkhatayan e û lijneya me wê dozê dê veke bo ku yasa bê sererast kirin. Ji ber eger li gor wê yasayê helbijartin pêkbê, kurd li navçeyên Kurdistanê dê dengên wan kêmbibin, ji ber yasa rê nade kurdên ku koçber bûne li derveyî parêzgehên xwe deng bidin."

Aliyên siyasî yên Kurdistanê daxwaz dikin yasaya helbijartinê encûmena parêzgehan bê sererast kirin, biryare meha çar a sala pêş helbijartinên encûmena parêzgehan li Iraqê pêkbê. **BasNews**

Eşîrên kurdên Rojava: Em dijî avakirina herêma ewle ne

Serok eşîrên kurd li Rojavayê Kurdistanê civînek li darxistin û di wê civînê da tekezî li ser wê yekê kirin ew li dijî avakirina herêma ewle ne li Rojavayê Kurdistanê û ew li dijî parçekirina Sûriyê ne. Li gorî ajansên herêmî yên



Rojavayê Kurdistanê belav kirine civîna eşîrên kurd li bajarê El-Malkiyê li parêzgeha Hesekê hat lidarxistin. Herwiha şêx û kesên binavûdeng ên eşîrên kurd, nunerên van eşîrên ereb û nunerên saziyên civaka sivil û eşîrên erebî jî beşdarî civînê bûne. Li dawiya vê civînê, daxûyaniyek hat dayîn ku têde, beşdaran daxwaza gotûbêja cidî û berpîrsane navbera Şamê û Rêveberiya Xweser a Rojavayê Kurdistanê kiriye. Beşdarên vê civînê raghandin ku divê armanca wan gotûbêjan, rêçareya qeyranê û girtina pêşiya her cure hewldana bona derbelêxistina li ewlehî û yekperçetiya erdê Sûriyê be.

Herwiha, Serokê eşîra kurd a Teyan Hewas Cedî aşkere kiriye kurd hemû dijberê parvekirina Sûriyê ne û ser ligel serweriya rejîma Sûriyê ne. **BasNews**

Şandeka Kurdistanê bo guftugokirina budçeyê diçe Bexdayê

Nûnerên Hikûmeta Herêma Kurdistanê li Bexdayê Faris Îsa aşkere kir ku wê hefteya bê roja sêşemê şanda Hikûmeta Herêma Kurdistanê serdana Bexdayê bike. Faris Îsa îro şemiyê 14-09-2019an ji malpera KDPinfoyê ra axivî û got: "Roja sêşemê hefteyê dahatû, şanda Hikûmeta Herêma Kurdistanê bi armanca guftugokirina projebudçeya sala 2020an wê serdana Bexdayê bike. Herwiha wê ligel hemû fraksiyonên li parlamentoya Iraqê jî bicivin." Herwiha Îsa got: "Weke nûnertiya Hikûmeta Herêma Kurdistanê em ê belgenemayekê ji Parlemantoya Iraqê ra bişînin bo ku li jîneyên neft û gaz û darayî û yasayî serdana Kurdistanê bikin û ligel Serokwezîrê Kurdistanê bicivin." **BasNews**

Nivîskarê Kurd Şahîn Bekir Soreklî li Stenbole semînerek da

Ji bo yek ji nivîskar û helbestkarê navdar yê Kurd Şahîn Bekir Soreklî li Stenbolê semînerek hat lidarxistin. Di semînerê de Soreklî li ser edebiyata Kurdî û sêrpêhatiyên xwe axivî û ragihand xeribiyê bandorek mezin li ser jiyana û niviskariya wî kiriyê. Kurdên ku beşdarî vê semînerê jî bûyîn ragihandin gotûbêjên bi nivîskaran re ji bo pêşketina zimanê Kurdî gelekî giring in.

Nivîskar û helbestkarê Kurd Şahîn Bekir Soreklî yê ku ev nêzîkî 50 sal in li Australyayê dijî û nêzîkî 30 salan di radyoya SBS ya Australyayê de bernamêyên Kurdî çêkirî li stenbolê, derbarê pirtûk, jiyana û sêrpêhatiyên xwe de semînerek da. Di vê semîna ku Kurdên Stenbolê eleqeyek mezin nîşandayî de Şahîn Bekir Soreklî ji pirtûkên xwe helbest û çîrok xwendin li ser rewş û pêşeroja Edebiyata Kurdî agahî da. Soreklî radgihîne xeribîya ji welat bandoreke gelek mezin li ser jiyana wî kiriyê lê ev xeribî bûye sebeb ku niviskariya wî pêşbikeve ew zêdetir berheman hilberîne.

Şahîn Bekir Soreklî, nivîskar, got: "Xeribî û dûrbûna ji welat bandoreke gelek mezin li ser hebûna me kir û dê heta mirinê bi me re bimîne. Me gelek tiştên xwe wenda kirin. Bi wê wendabûnê re agir û hesretek dinav kurahiya dilê me de çêbû. Vî agir û Hesretê gelek tişt ji



me anîn der. ew êşa di canê me de me bi rêya wê xeribiyê derxist. Em dixwazin tiştê bidin miletê xwe û welatê xwe em xwe wekî deyndar dibînin ji ber dûrbûna ji welat."

Kesên ku beşdarî vê semîrê bûyîn ragihandin kombûnên wiha yên bi nivîskaran re berê Kurdan zêdetir dide xwendin û nivîsandina Kurdî û bi rêya wê jî hem xwedî li nivîskarên Kurd tê derketin hem jî zimanê Kurdî pêşdikeve.

Ehmed Berojî, hevvelatî, dibêje: "Xwendina Kurdî bi ya min zêdetir bûye herçiqes zext li ser zêdetir be jî. Li ser medyaya civakî jî em dibînin nivîsandina Kurdî zêdetir bûye. Gelek kes li vê dere kombûne, Ev jî Ji bo Kurdî gelek baş e. Ji bo pêşveçûn û xwendina pirtûkên Kurdî nivîskarek ji Ewropa hatiye xelk xwedî lê derket, Ev ji bo

nivîskarên me jî gelek baş e."

Hevvelatîyek dî dibêje: "Bi rastî beşdariya ciwanan hinekê zêde bû, ev jî tiştê gelekî baş e başe û heviyek germ dike dile mirovan de. Ji bo pêşerojê ciwanên Kurd jî bixwînin, bidin xwendin û bibinin. Gelekî kêfxweşbûm gelekî başbû. Hêviya me ewe ku zêdetir bibin û herroj pêşde biçin."

Şahîn Bekir Soreklî yê ku sala 1946 li bajarê Kobanî ya Rojavayê Kurdistanê hatî dinê û piştî li Australyayê bicihbûyî li gel 30 sal xebatên xwe yên di radyoya SBS de 6 salan serokatiya yekemîn komeleya Kurdî ya Li Australyayê kiriye. Di vê semînera ku Kurdên stenbolê beşdariyek mezin lê kirin de jî Şahîn Bekir Soreklî ji kesên beşdar re hem pirtûkên xwe îmze kir hem jî li gel wan wêne girt. **kurdistan24.net**

Şanoya Mem û Zîn li Diyarbekirê hat pêşandan

Şanoya Mem û Zîn a ku ji berhema feylozofê Kurd Ehmedê Xanî hatiye derhênandin, piştî 5 salan car din hat pêşandan. Lîstika şanoyê ji aliyê Şanoya Bajêr a Amedê ve li Diyarbekirê tê lîstin û ji tîmeke 60 kesan pêk tê. Ev şano, ji aliyê nivîskar Kawa Nemir ve li gorî Kurdiya rojane hatiye nivîsandin. Şanogeran ji ber kêmdarfetiyê, şano li hola navendeke danûstendîne pêşkêşî temaşevanan kir û tevî vê yekê jî şano rastî eleqeyek zêde hat. Şanoya Mem û Zîn li ser daxwaza şanohezan, dê heta 8'ê Îlonê dewam bike.

Mem û Zîn, berhema navdar a Feylezofo Kurd Ehmedê Xanî; li Diyarbekirê, ji aliyê şanogerên Şanoya Bajêr a Amedê ve tê lîstin. Şanoya ku 5 sal berê ji aliyê nivîskarê Kurd Kawa Nemir ve li gorî Kurdiya rojane hatiye nivîsandin; ji aliyê şanoger Ruknetîn Gun ve hatiye derhênandin. Şanogeran, ji ber kêmdarfetiya hêwaneke şanoyê, şanoya Mem û Zîn li hola navendeke dan û stendîne pêşkêşî şanohezan kir. Şanoger Kemal Ülûsoy ku ji 20 salan zêdetir in di qada şanogeriya Kurd de cihê xwe digire, dibêje; ji ber ku ev lîstik ji berhema Feylezofo Ehmedê Xanî hatiye derhênan, eleqeya ji bo vê şanoyê hîn zêdetir e.

Şanoger Kemal Ülûsoy ji K24ê re got: "Piştî van salan, di derfetên



teng de di nav vê hêwana dan û stendîne de bi awayê teknîkî, bi awayê reqisvanan, bi awayê guherîna lîstikvanan, me careke din prova kir û em derketin pêşberî gelê xwe. Ev şeva yekemîn e, li gorî roja yekemîn, bi rastî jî eleqê zêde ye û ev yek jî me kêfxweş dike."

Şano her wekî ku di berhema Mem û Zîn de derbas dibe; li ser evîna Mem û Zîn, Tacdîn û Stî û berhevdayiya Beko Ewan pêk tê, hat lîstin. Di şanoyê de bal tê kişandin ku kesekî fitneyan derdixe, dikare bandoreke çawa li ser pergala jiyana mirovan bike. Şanoya ku ji tîmeke 60 kesî hat pêk hat, bi şewaza muzikalê hat pêşandan, ji ber vê yekê jî bandora şanoyê hîn zêdetir li temaşevanan kir. Şanoger Yavûz Akkûzû jî di rola Beko Ewan de derket pêşberî temaşevanan û wî jî got ku ji bo pêşvebirina

şanogeriya Kurd, hewcedarî beriya her tiştî bi temaşevanan heye.

Şanoger Yavûz Akkûzû dibêje: "Li gorî min, hunera Kurdî dema ku dengbêjek tiştêkî dibêje, çirokekê dibêje, di nav wê de lîstik jî heye, muzîk jî heye. Wekî rîtuêlên me yên berê yên gundan bifikirin, muzîk û reqîs û lîstik hemû di nav hev de bûn. Ango me xwest em formeke şanoya Kurdî ava bikin, bi vê formê em ketin nav vê lîstikê û li gorî min jî lîstikek xweş derket holê."

Şanoya Mem û Zîn, piştî 5 salan di 6'ê Îlonê de derket pêşberî temaşevanan û dê heta 8'ê Îlonê bidome. Hevserokê Şaredariya Bajêr Mezin a Diyarbekirê Adnan Selçûk Mizrakî yê ji kar hatiye dîrxistin jî ji bo piştgiriya li cem şanogeran cihê xwe girt. Şanoya ku 2 saetan dewam kir, rastî eleqeyek zêde ya şanohezan hat. **BasNews**

Sînemakara Kurd bêriya Efrînê kiriye û gelekî jî xemgîn e

Lîstikvana sînemayê ya Kurd ku ji Efrînê ye û yek ji lîstikvanên Sûrî yê naskirî ye, dibêje ew dixwaze ji nêzîk ve hunermendên Kurd nas bike û wê gelekî bêriya Efrînê kiriye û ji ber rewşa wê jî gelekî xemgîn e.

Canyar Hesen ji sala 2010an ve di rêzefilmên drama Sûrî de kar dike û ji navdartirîn rêzefilma tê de beşdar bûye bi navê (Bab El Hara) ye. Herwiha rol di hejmarek rêzefilmên de girtiye. **avestakurd.net**



